

Civîna Hewlêrê

Civîna Kurmancî ya 58an vê carê li Hewlêrê, paytexta başûrê Kurdistanê, di navbera rojên 21 - 28.05.2016an de li dar ket.

Hewlêr bajarekî gelekî kevn e û xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Despêka wê, li gor hindêk çavkaniyan, diçe heta 7-8 hezar salî berî niha. Navê wê di dema sumerîyan de wek Urbîlûm derbas dibe. Ev nav di dema asûrîyan de bûye Urbîlîm û piştî Arbêla. Bi dû re, di zimanê suryanî de bûye Arbêl, bi erebî Erbil û ji wir jî di kurdî de bûye Hewlêr /Hewlêr.

Hewlêrê di bin destê sumerîyan, asûrîyan, medîyan, axîmenîdîyan, makedonîyan, partîyan, sasanîyan, selçûq û osmanîyan de roleke mezin lîstîye. Bûye devereke gelekî girîng û stratejîk. Bi wext re bûye bajarekî pirrengî, hembêza xwe ji gelek netewe û diyanetan re vekirîye. Niha tê de ev pîrmeteweyî û pirdînî her berbiçav e. Neteweyên cuda cuda û dîn û diyanetên cihêreng her bi hev re wek bira dijîn. Bajar nimûneyeke gelekî baş ya pêkvejiyanê dinimîne.

Desthilatdariya kurdî dixebite ku ev pêkvejiyana her berdewam be, hevwelatîyên wê û yên başûrê Kurdistanê her di vê rêyê de tédikoşin û nişan didin ku ji vê prensîpê nehêne xwarê.

Me bi dirêjahîya civînê ev hewa tenefus kir, di vê atmosferê de, bi kar û xebata xwe ve mijûl bûn. Di gel xeteriyên terorê, gefa Da'îşê û krîza aborîyê em bi serbilindî li wir man û bi serbilindî vegeyriyan. Lê dilê me ma her li wir, di gel birayên me.

Di vê civînê de li ser babetên tével yên wek Balindeyên Kurdistanê, Faûna (heywan), Flora (gulûgiya), Termînolojîya pizîşkî, Çêkirina benî, bastêq û helîlan, Hin peyvên kêmnas/ nenas û Peyvên ji pirtûkên Xelîfe Üsiv hat kar kir.

Ev hevalên han di civînê de beşdar bûn: Rênas Awdal (Zaxo), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Omîdê Mistefayê Celalî (Bazîd), Lezgînê Çalî (Barzan), Elişêr (Wan), Ehmedê Dirihî (Çewlik), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Eyûb Kiran (Qerejdax), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Fadi Omer (Dihok), Zinar Soran (Dêrik), Têmurê Xelîl (Rewan), Îsmail Şahîn (Sêmel), Reşo Zilan (Agirî).

Encamên xebata civînê li jêrê tene pêvkêş kirin.

Termsaziya pizîşkî bi kurdî

- V -

Amadekar: Lezgînê ÇALÎ

| kurdî | turkî | fransîzî | îngilîzî |
|---|---|-----------------------------|--|
| kîmyaçare | kemoterapi | chimiothérapie | chemotherapy |
| kur | erkek çocuk, oğlan | garçon | boy |
| kurî | eksen | axe | axis |
| laşnasî | anatomi | anatomie | anatomy |
| mîrxîçik, mîrkute, mîrkutok, xwiriyên avî | suçiçeği | varicelle | chicken pox |
| hinavbînî | endoskopi | endoscopie | endoscopy |
| hinavbînk | endoskop | endoscope | endoscope |
| navdilkulî | endocardit | endocardite | endocarditis |
| neberdêrî | kısırlık | infertilité | infertility |
| neşterkar | cerrah | chirurgien | surgeon |
| neşterkarî | operatörlük, cerrahlık, cerrahlık ilmi | chirurgie | surgery |
| tanedêr | pirojenik olmayan, hararet oluşturmayan | non pyrogène | nonpyrogenic |
| nîşan | işaret | signe | sign |
| nûciwan | genç | adolescent | adolescent |
| nûza | yenidoğan | nouveau-né | neonate |
| nûzayane | neonatal | néonatal | neonatal |
| pizîşkê çavan | göz doktoru | ophtalmologue | ophthalmologist |
| pizîşkîya çavan | göz doktorluğu | ophtalmologie | ophthalmology |
| pankurm | tenya | ténia | tape worm |
| panpejîk | birkaç ülkeye yayılan, yaygın | pandémique | pandemic |
| pizîşkê zarokan | çocuk doktoru, pediatrist | pédiatre | pediatrist |
| pizîşkîya zarokan | pediatri, çocuk doktorluğu | pédiatrie | pediatrics |
| pejîk, şof | salgın hastalık | épidémie | epidemy |
| pejîknas | epidemiyolojist | épidémiologiste | epidemiologist |
| pejîknasî | epidemiyoloji | épidémiologie | epidemiology |
| perçivtin, perçifin | ödem | œdème | oedema |
| perçivtî, perçifî | ödemli | œdémateux | oedematous |
| perdemêjî | beyin zarı | méninge | meninges |
| perdemêjîkulî | menenjit | méningite | meningitis |
| pest | basınç | pression | pressure |
| pesta xwînê | tansiyon | tension | blood pressure |
| pesta çavî | göz tansiyonu | tension oculaire | intraocular pressure |
| pestandî | sıkıştırılmış | pressurisé | pressurized |
| pestandin | sıkıkmak, basıncını ayarlamak | pressuriser | to pressurize |
| pestpîv | sfigmomanometre, barometre | sphygmomanomètre, baromètre | sphygmomanometer, barometer |
| pis | erkek oğlan | fiis | son |
| pişkûlî, sîkulî, pişkûlî, satilcan | pnemonit, akciğer iltihabı, zatürye | pneumonie | pneumonitis |
| pizîşk | doktor | docteur | physician |
| pizîşkî | tıbbi | médical | medical |
| pizîşkî | tıp | médecine | medicine (science) |
| riskîyan | sedimentasyon | sédimentation | sedimentation of a solution, sedimentation |
| saxlem, tendurist | sağlıklı | sain, en bonne santé | healthy |
| saxlemî, tenduristî | sıhhiye, sağlık | santé | health |
| şilemenî | sıvı, akıcı | liquide | liquid |
| sinêle, sengele | genç, delikanlı | adolescent | teenager |

| | | | |
|----------------------|------------------------------------|---------------------------------|--------------------------------|
| sinêletî | gençlik, delikanlılık | adolescence | teenage |
| sîngkulî | zatürriye | pneumonie | pneumonia |
| şîrxwerî | bebeklik dönemi | petite enfance | infancy |
| şîrxwer, berşîr, pit | bebek | bébé | infant |
| sorgok | alyuvar | érythrocyte, hématie | erythrocyte |
| sorîlank | dölüt, fetus | foetus | fetus |
| spîgok | akyuvar | leucocyte | leukocyte |
| stewr | steril | stérile | sterile |
| stewrandin | 1. sterize etmek, 2. sterilizasyon | 1. stériliser, 2. stérilisation | 1. sterilize, 2. sterilization |
| stewrî | sterilik | stérilité | sterility |
| şû, mêr | koca | mari | husband |

Faûna

Semender, beq, req, kûsî

Amadekar: Eyûb SÎNAN KIRAN

SEMENDER

| kurdî | latînî | tirkî | fransizî | îngilizî |
|----------------------|--------------------------------|---------------------|-------------------------|-----------------------|
| semenderê Colemêrgê | <i>neurergus strauchi</i> | Hakkari semenderi | salamander de Hakkari | Hakkari's potted newt |
| semender | <i>salamandra salamandra</i> | lekeli semender | salamander de feu | fire salamander |
| semenderê Ürmîyê | <i>neurergus crocatus</i> | Ürmiye semenderi | salamander d'Ourmieh | Lake Ürmiya newt |
| semenderê Kurdistanê | <i>neurergus microspulotus</i> | Kürdistan semenderi | salamander du Kurdistan | Kurdistan newt |



Semenderê Colemêrgê
Neurergus strauchi



Semender
Salamandra salamandra



Semenderê Ürmîyê
Neurergus crocatus




Semenderê Kurdistanê
Neurergus microspulotus

BEQ, REQ Û KÛSÎ

| kurdî | latînî | tirkî | fransizî | îngilizî |
|-----------------------|----------------------------------|--------------------------|----------------------------|----------------------------|
| beqa bibelalûk | <i>bufo bufo</i> | sigilli kurbağa | crapaud commun | common toad |
| qurqurk | <i>bufo viridis</i> | gece kurbağası | crapaud vert | the european green toad |
| beqa dara | <i>hyla arborea</i> | ağaç kurbağası | rainette verte | common tree frog |
| beqseydik, beqa kesk | <i>hyla savignyi</i> | yeşil kurbağa | rainette européenne | european tree frog |
| beqa golan, beqbelûsk | <i>rana ridibunda</i> | ova kurbağası | grenouille rieuse | marsh frog |
| beqa xetxetî | <i>rana camerani</i> | şeritli kurbağa | grenouille zébrée | stripped frog |
| req, sêlak | | su kaplumbağa | tortue d'eau | pond turtle |
| reqê golan | <i>mauremys caspica</i> | hazer çizgili kaplumbağa | tortue de la mer Caspienne | Caspian turtle |
| reqê deqdeqî | <i>emys orbicularis</i> | benekli kaplumbağa | cistude | European pond turtle |
| reqê Feratê | <i>rafetus euphraticus</i> | Firat kaplumbağası | tortue d'Euphrate | Euphrates softshell turtle |
| kûsî | <i>testudo graeca terrestris</i> | tosbağa | tortue, tortue terrestre | common tortoise |




Beqa bibelalûk
Bufo bufo



Beq Qurqurk
Bufo viridis



Beqa dara
Hyla arborea



Beqseydik, beqa kesk
Hyla savignyi



Beqa golan, beqbelûsk
Rana ridibunda



Beqa xetxetî
Rana camerani




Reqê Golan
Mauremys caspica



Reqê deqdeqî
Emys orbicularis



Reqê Feratê
Rafetus euphraticus



Kûsî
Testudo graeca terrestris

Hin berhemên ji tirî

Amadekar: Hemîd KILIÇASLAN

Ez li mala Hecî Mihemed Bakay bûme mêvan û min pirsra mahsera - miştaxa ji Hecî û xanima wî kir. Mala Hecî li gundê Misûriyê di nav rez û erdê bav û kalên wan de, bi awayekî nûjen hatibû avakirin. Bi dilovanî heciyê (72) heftê û du salî û xanima wî Rûqiye ya ku di heman jiyê de bû, dest pê kirin, ji me re mijara kewdan, miştaxa û çêkirina benî û bastêqê vekirin. Qin bi qinê ve dikirin. Gava min li wan guhdarî kir, ew hest bi min re çêbû ku her wekî ez li nav rez im û me dest bi çêkirina benî - sîncoq û bastêqê kiriye. Carinan xanima Hecî, xwe li gemê dida û dikudand ku beniyên xwe di pelûlê de bike, lê Hecî bergiya wê dibirî û digot "hela raweste em hê nehatine wî delavî". Her weha me roja 17ê gulana 2016an şevbuhêrkeke bi dilê xwe derbas kir.

Ji xwe tiriyê baş û xweşik di ber re dihêt çinîn û dihere bazarê. Payiza paşin ew tiriyê ku nehatiye hevdan di mêwê de mayî, ketober dihêt hevdan. Navê wê hevdanê çinîn e. Helbet ew tirî bêtir tiriyê mezrone, yê şîreyê ye û di payiza paşin de, di mêwê de û wek efara tirî, bi yek qutfên di mêwê de dimînin re ketober dihêne hevdan.

Dema em tiriyê mayî tevî berhev dikin, diçin, em tînin miştaxa, dixin kîsan an telîsan, diesirînin, diguvêşin, ji bo ew keşmûna mayî baş zuha bibe, em wan guvişkên keşmûnê dixin mengenyê diguvêşin da av tê de nemîne, zuha bibe.

Ew şîreya ku me ji tirî wergirti, em dixin neqran. Li gora pîrbûna şîreyê em hinek axa sipî dixin nav, tevlê dikin. Ew axa sipî ji bo dawerivandin û sipîkirina şîreyê ye. Bi gotineke din şîreya tirî bi wê axa sipî rafîne dibe. Navêkî din yê wê axa sipî, axa dîmsê ye.

Em paşê şîreya xwe dikewidînin. Kewidandin nîvkelfî kirin e. Di wê nîvkeliyê de, dema gemara di nava şîreyê de ya bi ser dikeve, agir ji binê neqrê vedikişînin, em wê şîreya nîvkelfî heta ku sar bibe, bicemide, di nav re tev didin, li hev dixin, bi vî awayî ew gemar dadinîsile, xwe bera binî dide.

Dema şîre sar bû, cemidî û gemarê xwe bera binî da, em di ser re ya paqij diparzinînin, em wê şîreya paqij vedigerînin neqreke din, ji nuh ve agir dixin bin. Heta bi kel were, em dikelînin, dema bikele kef bi ser dikeve, em cara duduyan wê kefê ji ser diqêşêrin, em wê qeşartîne bi kevgîrê dikin.

Ger ew şîre ji bo bastêqê be, em hinek ard-arvan tev lê dikin, ya ji bo benîyan be ardê wê hinekî zêdetir e, qalindtir dibe.

Tasa yendo, ew tasa bi çembilê dirêj, ji me re tasa pîvana şîreyê ye. Wê şîreya arvan li nav ketî, ji bo nebe girêk, em di safokekê re diparzinin, li safokê dixin. Em wê şîreya paqij ku di safokê re hatiye parzinandin dîsa dixin neqra, didin ser êgir û heya dikele tev didin. Piştî kel pêket em hêdî, hêdî agir ji binê neqrê dibirin. Carinan em sêlekê dikin navbera êgir û neqrê û carinan em agir ji binî vedikişînin, da zêde nekele û nebe girêk û neşewite.

Dema pelûla me hazir bû, destpêkî em ji bo bastêqê bi kar tînin. Paçikên hêzar an naşor, cabonê baş ku me amade kirine, em du tasên yendo bera ser paçikê bastêqê didin, du kes wê pelûlê bi hosteyî li ser wî paçikî li hev vedigerînin û tenik lê belav dikin. Dema hê pelûl germ e em tenik di paçikê didin, em nahêlin qalind bibe. Bastêqa peltenik û sipî ya baş e.

Benî-sîncoq ji bo yê nîvkelfî ye. Pelûla beniya hinekî qalindtir ango tîrtir e. Ji bo tîrtir bibe hinek arvanê zêde dikeve nav. Em berê gwîzên xwe yê malê, ger xwe-malî tune bin yê kirrîne, yê qenc em berî şkenandinê demekê dixin nav avê. Di avê de êvarekê an çend saetan dihêlin da ku di şkenandinê de qin hûr nebin. Em gwîzên xwe dişkênin, qinên xwe darvedikin, benikên qin pê ve darvekirî, bi aqûlan ve girêdidin, bi dar de dikin. Aqûl ew darikên serê wan çetelî ne û ji bo bidardekirinê bi kêr in. Li gora qalindbûnê em carekê an çend caran wan gwîzên darvekirî ku aqûl bi serê benikê beniya ve girêdayî, di pelûlê de dikin. Ew pelûla ji ber benî û bastêqê dimîne û nema bi kêr tê bera teştêkê an ser sinîyekê didin hinekî zuha dikin. Di pey re em bi kêran dîlim dîlimî dikin û wek kesme em hiltînin.

Ev pêzanînen ku min ji Hecî Mihemed û mala wan wergirti anî û ji muxtarê Misûriyê, ji Mehmet Bakay re xwend da ku kêmaniyan bibînim û li agahdariyên xwe zêde bikim. Muxtarê me yê hêja pîrr dilşad bû kêfa xwe gelekî anî û got; mala te ava te hemî tişt qin bi qinê vekiriye, pesnê nivîsa min da. Lê dîsa ji hin tişt min ji muxtarê xwe wergirti. Ez wan ji li vir pêşkêşî we hêjayan dikim.

Me berê, tiriyê xwe yê şîre li ser tahteke ku hewdekî ji keviran di binyê re çêkirî radixist. Me li ser wê tahtê di telîs û kîsan de ew tiriyê xwe diguvaşt. Ava wî tiriyî ango şîreya ji kîsan diherikî, dikete wî hewdî. Me ji wir bi satilan ew şîre bera neqran dida û dikewidand. Lê nuha em hewdên ji betonê çêdikin. Kewidandin yanî şîrgermî kirina şîreyê ku nîvkelfî dibû û qirş gemar bi ser diket. Me bi miqêşê ew gemar ji ser digirt. Me ew herrî, gemara ku ji şîreyê diqêşart dixiste kîsan û bi dar de dikir. Me satilek datanî binî ku ew av, şîreya ji kîs

dadinîsîlî careka din li neqrê vedigerand. Ew herrî û pîrrîka di kîs de mayî êdî ya avêtinê bû, me dirijand. Kîsên xwe dişûst û ji bo bikaranîna careke din hiltanî.

Min ji muxtar pirsra miqêşê kir; got doxa wê dirêj, serê wê fireh, girover û qulqulî ye ku bi wê kef û gil û gemar ji ser şîreyê digirtin ango wek Hecî Mihemed gotî diqêşartin. Tişt min jê fehm kir, kevgîra mezin e.


Her weha, muxtarê dilovan, kar û berpirsiyariyên xwe hemî li aliyekî hişt û bi pirsên min ve daket. Dilê xwe bijand vê xebata hêja û xwest ji dil alikariya min bike. Bi berdewamî, tevdan-lihevixistina şîreyê gelekî girîng dît ku divê bihête nivîsandin. Dema me ardê xwe, arvan diavêt nav şîreyê, me dest bi tevdanê dikir. Hem agir di bin neqrê de ye û hem jî em li ser hev bi darekî şîreyê li hev dixin. Divê agir nerm be, yanî ne agirekî gûrr be û li ser hev ew şîre were tevdan, lihevixistin. Darikê pelûlê, ew darê ku pê pelûlê li hev dixin, darekî wek doxa merrekê ye, serê wî befsîkî, pan e. Serê wî darê befsîkî carinan bi sifir ango bi paxir dihate kiras kirin da ku tama pelûlê xera neke. Em her serê wî darikê pelûlê li binê neqrê dibin û tînin da ku binî negire, nebe girêk û neşewite.

Beran, bêcik: darikên mêwan qul dikirin û darikên ziravtir tê re derbasdikirin, dixistin temtêla tişt û tebayên dilên wan dixwest, qinên gwîza dixistin qirîka wan, bi gwîzan dixemilandin û di pelûlê de dikirin. Wek: beran, mirov, dîk hwd.

Qumaşk: Bi çirpiyên ji hinarê yan ji belalûkê şivên nerm wek sê xelekên girover di ser hev re li darikên silêvî li hev suwar dikirin. Dîsa bi gwîzan guluk pê ve dikirin, dixemilandin, çend caran di pelûlê dadikirin. Dibû selikeke ji pelûlê û ji gwîzan, pê dilê zarokan şad dikirin û carinan hundurê wê ji bi qin û çerezan dadigirtin.

Mewij: Tiriyên di rez de dimînin didin hev, berhev dikin. Helbet tiriyên mewîjan cihê ye. Jê re tiriyê cînas dibêjin. Cînas cureyekî tiriyên xweşik e, baş e, zû digihê, namîne payiza paşin. Tiriyên mayî diçin, tînin li miştaxan radixin, libên xerabe jê dîneqînin. Yê paqij û neqandî bi hinek zeyta zeytûnan û ava bi ariya êzingan kelandî, dişon û dixin selikên çirpî. Ew tiriyên mewîjan yê paqij û neqandî, di wê sepetê de dikin û li miştaxan radixin. Heta ew tirî zuha bibe li ser miştaxan raxistî dimînin. Zuhabûn, li gora tîna rojê, ji hefteyekê heta bi deh rojan diajo. Piştî zuha bû, didin hev dîsa dixin selikan û ava paqij lê dikin, dişon. Piştî şûştinê li ser paçikên paqij radixin heta zuha dibe. Piştî zuhabûnê li serradê dixin, ji darik û kirşan paqij dikin û hiltînin.

| kurdî | tirkî | fransîzî | ingilîzî |
|----------------------------------|--|--|--|
| dema kergê: dema mehserê | bağbozumu zamanı | période des vendanges | vintage season |
| mehser, masere, isle, ûsil, îsir | şirahane, üzüm şirasının çıkarıldığı yer | pressoir à raisin, emplacement du pressoir | the place where grapes are crashed to produce syrup |
| mehsere | üzümün sıkılarak şirasını çıkarma işlemi | pressurage | crashing or squeezing of the grapes to produce syrup |
| miştaxe | üzüm kurutma yeri | emplacement du séchage des raisins | a place where grape are left to dry in order to produce raisin |
| kewidandin | üzüm şirasını ısıtmak | bouillir le jus de raisin | to boil the grape juice |
| tiriyê mezrone | şıra üzümü | chasselas | chasselas |
| qutîf, çirtim, siqil, tilmist | cıngıl | grapillon | a part of a cluster |
| şîre | şıra | jus de raisin pressé | concentrated syrup |
| efara tirî: paşerok | bağ bozumu artığı | résidus de vendanges | leftover of harvest |
| esirandin, givaştin | sıkmak | presser, pressurer | to squeeze |
| keşmûn, pap, simarte, sîmirte | posa | lie de raisin | dregs |
| neqir, niqre, dist | büyük kazan | chaudron | large cauldron |
| moçik | uzun saplı tas | louche | big and deep ladle |
| naşor, cabon, japon, çapon | amerikan bezi | éttoffe en coton blanc | american cloth |
| aqûl, heçik, çelake | çengel | crochet, croc | hook |
| miqêş, kevgîra mezin | büyük kevgir | grand écumeiro | large skimmer |
| tiriyê cînas | cins üzüm | variété de raisin de qualité | a noble sorts of grape |
| qin, kakil | ceviz, badem gibi yemişlerin içi | cerneau | kernel |



Tiriyên mezrone
chasselas grapes



Helîl - kesme-pelît-peksîmet : confection or delicacy made of grape juice and flour



Mewij: raisin



Dims - mot-doşav - dîfs: boiled grape juice



Benî - meşlûr - orcix - sicûq - sincix - kome - şaran: confection of nuts dipped in grapes juice



Bastêq: fruit pulp dried in thin layers

Balindeyên li Kurdistanê

- II -

Amadekar: Îsmâil TAHA ŞAHÎN

| kurdi | latîni | tirkî | fransîzi | îngilizî |
|---|--|---|---|----------------------------|
| başkulok | <i>saxicola torquata</i> | taş kuşu | tariet pâtre, traquet pâtre | african stonechat |
| serqelûnk, belg, qîrik | <i>phoenicurus ochruros</i> | kara kızılkuayruk | rouge-queue noir | black redstart |
| bilbil, hizar | <i>lusciniâ megarhynchos</i> | bûlbûl | rossignol | nightingale |
| dûvsork, kurîsork, dûvsoran, bûkesor, dûbilindik, dûlesorik, kurîrepînk, kurîfitînk, terîsorik, dwîhelînk, pitpitok, pit, boqsor | <i>cercotrichas galactotes</i> | çalı bûlbûlî, pas renkli çalı kızıl gerdanî | agrobate roux | rufous, tailed scrub robin |
| bersorik, berçêlsorik, binhefsorik, behefsorik, bûksoran, cwîsorik, melak, melasorik, qurimdar | <i>erithacus rubecula</i> | kızılgerdan | rouge-gorge | european robin |
| bindehlok | <i>cettia cetti</i> | kamîş bûlbûlî | fauvettes des roseaux, phragmite, bouscarle de cetti | cetti's warbler |
| xiçik | <i>acrocephalus melanopogon</i> | bıyıklı kamîşçın | lusciniolâ à moustaches | moustached warbler |
| çûçeşîn | <i>hippolais pallida</i> | ak mukallit | fauvette pâle | eastern olivaceous warbler |
| serreşik | <i>sylvia atricapilla</i> | karabaş ötleğen | fauvette à tête noire | eurasian blackcap |
| hejîrok | <i>sylvia borin</i> | boz ötleğen | fauvette des jardins | garden warbler |
| têltênbûrik | <i>scotocerca inquieta</i> | sûrmeli çalı ötleğeni | dromoiqûe vif argent | streaked scrub warbler |
| sîçipk | <i>phylloscopus trochilus</i> | söğütbûlbûlî | pouillot fitis | willow warbler |
| çirkone, çilmêrik, çilmêre, dehlîk, bintanik, wincik | <i>phylloscopus collybita</i> | bayağı çıvgın | pouillot véloce | common chiffchaff |
| çeççeçok, kezanok, çixçixk, çikçikan | <i>muscicapa striata</i> | benekli sinekkapan | gobe-mouche gris | spotted flycatcher |
| belakîtik, gumgumî | <i>ficedula albicollis</i> | halkalı sinekkapan | gobe-mouche à collier | collared flycatcher |
| poşîreşk, mamreşik, êtîmok: | <i>parus major</i> | büyük baştankara | mésange charbonnière | great tit |
| serşînk, seraşînok, xecxecok | <i>parus caeruleus</i> | mavi baştankara | mésange bleue | eurasian blue tit |
| pisipik, tilxwerk, dûvçinarik | <i>remiz pendulinus</i> | bayağı çulha kuşu | rémiz penduline | eurasian penduline tit |
| berkute, belîkute, berkure, belîşte, fiştik, toteber, toteberk | <i>sitta tephronota</i> | büyük kaya sıvacı kuşu | sittelle des rochers | persian nuthatch |
| kevîrhilperk, teyirkê kevran | <i>tichodroma muraria</i> | duvar tırmaşık kuşu | grimpeur échelette | wallcreeper |
| çirçirok, çirçirk, çirçiradînk, garisok, cit, diç, sîlîl, hinbank | <i>emberiza calandra</i> | tarla kiraz kuşu | bruant proyer | corn bunting |
| çûka zer, zerwêleyê cehan, beyarok, çîçilo, çûkzer, çûçezzer, tûtre'êl, zerolî, berzere | <i>emberiza melanocephala</i> | kara başlı çinte | bruant mélanocéphale | blackheaded bunting |
| kezwankelotik | <i>coccothraustes coccothraustes</i> | bayağı kocabaş | gros-bec, casse-noyaux | hawfinch |
| zengulîtik, zengilok, zengulîlat, zengilîle, kilîlmilîl, belingosik, serxûnik | <i>carduelis carduelis</i> | saka kuşu | chardonneret élégant | goldfinch |
| serstîrik, çûçika têvrîyan | <i>carduelis cannabina</i> | keten kuşu | linotte mélodieuse | common linnet |
| sivyankê çolê | <i>passer hispaniolensis</i> | söğüt serçesi | moineau espagnol | spanish sparrow |
| sêdidank | <i>petronia petronia</i> | kaya serçesi | moineau soulcie | rock sparrow |
| reşîşik, zerzûrî, gwîbijînk, reşwêle, reşolî, reşçêle | <i>sturnus vulgaris</i> | sığircik | étourneau sansonnet | starling |
| teyirkulî, xezayî, xezayîk, xezalok | <i>sturnus roseus</i> | ala sığircik | étourneau roselin | rosy starling |
| zerwêle, zerwêleyê şamî, zerwêlê xatûnî, zerêle, pîropîro, tuyotuyo, tiyopiyo, silobapîro | <i>oriolus oriolus</i> | bayağı sarıasma | loriot d'Europe | eurasian golden oriole |
| qîrgurg, qira kelexan, qijak | <i>corvus corax</i> | karakarga | grand corbeau | common raven |
| qelereşk, kelebeş | <i>corvus corone</i> | leş kargası | corneille noire | carrion crow |
| qîr, qirika belek, qîrbelek, qelegewir, qîrgewrik | <i>corvus cornix</i> | başlıklı karga | corneille mantelée | hooded crow |
| qîrereşka ziyanan, qîrereşik, qellexirab, qellexurav | <i>corvus frugilegus</i> | ekin kargası | corbeau freux | rook |
| qijqelank, qelqîşk, qelespîk, qelebask, qijqel, dûvdirêj, qijok | <i>pica pica</i> | avrupa saksaganı | pie bavarde | eurasian magpie |
| şirkak, kîrkak, kîrkewk, çilkak, alik | <i>garrulus glandarius</i> | bayağı alakarga | geai des chênes | eurasian jay |
| qaqîşk, qelqîj, qelqîjk, qijyank, qaqwîşk | <i>pyrrhocorax</i> | kırmızı gagalı dağ kargası | crave à bec rouge | chough |
| Balindeyên malî | | | | |
| mirîşk | <i>gallus gallus domesticus</i> | tavuk | poule | chicken |
| 'elok, 'elelok, culux, qulî, qulîqulî, antax, mirîşka şamî, şamî, hindî | <i>meleagris gallopavo</i> | hindi | dindon sauvage | turkey |
| mirîşka fir'ewnî | <i>numida meleagris</i> | yabani beçtavuğu | pintade de numidie | helmeted guineafowl |
| Hin bilindeyên biyanî yê naskirî | | | | |
| tawîs | <i>afropavo congensis</i> | tavus | paon | peacock |
| totîk, tûtîk, tolî | <i>psittacula krameri</i> | papağan | perroquet | parrot |
| kerdîkil | <i>Struthio camelus</i> | devekuşu | autruche | ostrich |



başkulok -
saxicola torquata



serqelûnk, belg, qîrik -
phoenicurus ochruros



bilbil, hizar -
luscini megarhynchos



dûvsork, kurîsork,
dûvsoran, bûkesor,
dûbilindik, dûlesorik,
kurîrepînk, kurîfitînk,
terîsork, dwîhelînk,
pitpitok, pit, boqsor -
cercotrichas galactotes



bersorik, berçêlsorik,
binhefsorik, behefsorik,
bûksoran, cwîsorik, melak,
melasorik, qurimdar -
erithacus rubecula



bindehlok -
cettia cetti



xiçik -
acrocephalus melanopogon



çûçêşîn -
hippolais pallida



serreşîk -
sylvia atricapilla



hejîrok -
sylvia borin




têltenbûrik -
scotocerca inquieta



sîçîpk -
phylloscopus trochilus



çîrkone, çîlmêrik, çîlmêre,
dehlîk, bintanik, wincik -
phylloscopus collybita



çeqçeqok, kezanok, çixçixk,
çikçikan -
muscicapa striata



belakîtîk, gumgumî -
ficedula albicollis



poşîreşk, mamreşîk, êtmok -
parus major




serşînk, seraşînok, xexxecok -
parus caeruleus




pisîpîk, tilîxwerk, dûvçinarîk -
remiz pendulinus



berkute, belîkute, berkure,
belîşte, fiştîk, toteber, toteberk -
sitta tephronota




kevîrhîlperk, teyîrkê kevran -
tichodroma muraria



çîrçîrok, çîrçîrk, çîrçîradînk,
garîsok, cî, diç, sîlîl, hinbank -
emberiza calandra




çûka zer, zerwêleyê cehan,
beyarok, çîçîlo, çûkzer, çûçezzer,
tûtre'êl, zerolî, berzere -
emberiza melanocephala




kezwaneklotîk -
coccothraustes coccothraustes



zengulîtîk, zengîlok, zengulîlat,
zengîlîle, kilîmilîl, belîngosîk,
serxûnîk -
carduelis carduelis



serstîrîk, çûçîka têvrîyan -
carduelis cannabina




sivyanê çolê -
passer hispaniolensis



sêdidank -
petronia petronia



reşîşîk, zerzûrî, gwîbijînk,
reşwêle, reşolî, reşçêle -
sturnus vulgaris



teyîrkulî, xezayî, xezayîk,
xezalok -
sturnus roseus




zerwêle, zerwêleyê şamî, zerwêlê
xatûnî, zerêle, pîropîro,
tuyotuyo, tiyopiyo, silobapîro -
oriolus oriolus




qîrgurg, qîra kelexan, qîjak -
corvus corax



qelereşk, keleş -
corvus corone




qîr, qîrika belek, qîrbelek,
qelegewir, qîrgewîrk -
corvus cornix



qîrereşka ziyanan, qîrereşîk,
qelexîrab, qelexurav -
corvus frugilegus



qîjqelank, qelqîşk, qelespîk,
qelebask, qîjqel, dûvdîrêj, qîjqok -
pica pica



şîrkak, kîrkak, kîrkewk,
çîlkak, alîk -
garrulus glandarius



qaqîşk, qelqîj, qelqîjk, qîjyank,
qaqwîşk -
pyrrhocorax



Balindeyên
malî




mirîşk -
gallus gallus domes-ticus




'elok, 'elelok, culux, qulî,
qulîqulî, antax, mirîşka,
şamî, şamî, hindî -
meleagris gallopavo




mirîşka fîr'ewnî -
numida meleagris



Hin bilindeyên
biyanî yên
naskirî



tawîs -
afropavo congensis




totîk, tûtîk, tolî -
psittacula krameri



kerdîkil -
struthio camelus

Endamên laşên çûkan


Amadekar: Îsmâîl TAHA ŞAHÎN



| kurdî | tirkî | fransizî | îngilizî |
|-----------|-------|-----------------|------------------|
| enî | alın | front | front |
| alek, rû | yanak | joue | cheek |
| nikil | gaga | bec | beak |
| banê serî | tepe | sommet du crâne | top of head |
| patik | ense | nuque | back of the head |

| | | | |
|-----------------------------|-----------------------------|-------------------------|--------------------|
| navmil | omuz | partie inter-scapulaire | interscapular area |
| pişt | sırt | dos | back |
| binpişt, qaçik | kuyruk | bas du dos | low back |
| | sokumu | | |
| dûv, kurî, boçik, terî | kuyruk | queue | tail |
| bindûv | altkuyruk | croupion | vent |
| şaper | uçuş tüyleri | remige | primary remigez |
| tenişt, tehêl, kêlek | yan göğüs | flanc | flank |
| roq, çîp | kuş bacağının üçüncü bölütü | tarse | tarsus |
| penc | pençe | griffe | clow |
| ran, hêt | but | cuisse | thigh |
| zik | karın | ventre | belly |
| serçeng | kanat ucu | extrémité de l'aile | manus |
| berçêlk, qûtildank, bertork | kursak | jabot | crop |
| guhik | kulakçık | oreillette | auricle |
| qirik | boğaz | gorge | throat |
| erzink | çene | menton | chin |

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilizî |
|------------------------------------|--------------|---------------|------------|
| meji, mêjî | beyin | cerveau | brain |
| sorîçk, sorsork | yemek borusu | œsophage | oesophagus |
| kirkirk | soluk borusu | trachée | trachea |
| berçêlk, qûtildank, bertork | kursak | jabot | crop |
| dil | kalp | cœur | heart |
| cerg, ciger, mêlak, kezêb | karaciğer | foie | liver |
| rûvîk, rovî, rûdî | bağırsak | intestin | intestine |
| botir, pind | kloak | anat. cloaque | cloaca |
| gulçîsk, gurçîsk, gurçik, guhçilik | böbrek | rein | kidney |
| malhêk, hêkdank | yumurtalık | ovaire | ovary |
| ûrik, kursîdank, destarok, aşik | taşlık | gésier | gizzard |
| piş, pişik, sih, sipelk | akciğer | poumon | lung |



Hin peyvên kêmnas – nenas

- V -

Amadekar: Reşo ZÎLAN

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilizî |
|--|---|---|---|
| navçît: benpork, pê kezîyên xwe girê didin | örük bağı | ruban pour nouer les nattes de cheveux | hair ribbon |
| navrewan: navran, di şalwar de sêkuja di navbera herdu lingan de | apışlık | entrejambe du pantalon, du pantalon bouffant | a piece of cloth in a trouser covering crotch |
| teberzîn | teber | hallebarde | halberd |
| nefsmezî: qure | havalı | arrogant, prétentieux | arrogant, self-important |
| nehêre | yayık | baratte | a churn |
| nîçkirin | fondip | action de boire (cul sec) | quaff |
| nîç kirin | fondip yapmak | boire (cul sec) | to quaff |
| niyas: nas | tanıdık | relation, connaissance | acquainted |
| berniyas, bernas | tanınan, bilinen | familier, connu | familiar, know |
| pale pûse: pel û pot, pizgur, pilî pirtî | pılıpırtı | bric-à-brac | junk, clobber |
| palebetalk: şeytanmijûlk, karbetalk, şivanşitexilînk | çalışan birini oyalamak veya dikkatini dağıtmak | chose ou élément qui distrait du travail, distraction | distractor or distraction from serious work |
| palor: palûl, mijane, mijank | kızağın boyunduruk bağlantı çubukları | bâtonnets de connexion de l'axe du traîneau | yoke's rod ? |
| paloş: pelax, pelex | kurutulmuş ot | herbe sèche | dried gras |
| paşedîn | arı kovanlığı | rucher | apirary |
| pêberjêr | yokuş aşağı | descente | downhill |
| pêberjor | yokuş yukarı | montée | uphill |
| pêgirtêk | 1. merdiven korkuluğu, 2. parmaklık | rampe de l'escalier, ballustrade | 1. staircase, 2. railing |
| pêhevraz | yokuş yukarı | montée | uphill |
| peletî: pele'ewir, pel, pelt, pelta ewir | bulut parçası | un bout de nuage | clouds part |
| pêrê: rêbizink, êkpê | patika | sentier, sente, sentier de chèvre | hiking ??? |
| perese bûn: terebera bûn, tarovaro bûn, bijale bûn, pijale bûn, belawela bûn | darmadağın olmak | être sans dessus-dessous, être éparpillé | to be scattered |
| perese: terebera, tarovaro, bijale, pijale, belawela | darmadağın | éparpillé, en désordre | scatterd |
| pêvend kirin: aşle kirin, patrome (petreme, petirme, metirme) kirin | aşlamak | greffer, transplanter | to graft, transplant |
| pêvend | aşılama | greffe, transplantation | graft, transplant |
| pêxîk: taq | kör pencere | niche (dans le mur) | niche |
| bargîn: bargîr, beygîr | beygir | rosse, cheval de somme | packhorse |

| | | | |
|-------------------------------------|--|--|--|
| pêxim lê xistin: pêyê xwe lê xistin | sekte vurmak | empêcher, entraver, interrompre, suspendre | to impede, to interrupt, to block |
| pêxim | sekte | interruption, suspension, arrêt | standstill, failure, interruption |
| peyik | peyk: şalvarda apışlık uzantısı | entre-jambe ample du pantalon bouffant | baggy part of a pair of shalvar |
| pîngal: hêlîvank, motik, pînekal | fol | pondoir | poultry nest egg |
| pîngaz | tavuğun yuva dışında yumurtladığı yer | lieu où les poules pondent à l'extérieur du nid | place the hen lays her eggs outside the nest |
| barîbûyî, bacêle | yuva dışında ya da gizli bir yerde yumurtlayan tavuk | poule qui pond hors du nid ou dans des endroits cachés | the hen that lays eggs out of her nest or in secret places |
| qeb xwastin: meydan xwastin | meydan okumak | défier | to challenge |
| qeb: hevrik | rakip | rival, concurrent | competitor |
| rax: best | yatak (ırmak vs için), | lit | |
| "raxa çêm" | | lit de rivière | river bed |
| semax | oturaklı, ağırbaşlı | sérieux, solennel, tenace | sober, solemn |
| <filankes mirovekî semax e> | | (qqn est un homme sobre) | |
| sengolik: sengol, singol, singole | bir yaşını doldurmuş dana | veau d'un an | one year old calf |
| sengole | (mecazi) tonbul genç | adolescent dodu, | an obese teenager |
| sûs girtin: jeng girtin | paslanmak | rouiller | to rust |
| şatik (Qoçgirî) | ense | nuque | nape |
| şay | oyunda eş | partenaire de jeu | fellow-players |
| şeh | tüfekte fişeklerin sürülerek takılan yaylı altlık | chargeur à ressorts d'arme à feu | magazine |
| şel: şîl: | parça | morceau, motte | piece |
| <şelek bûz> perçe | "buz parçası" | « bloc de glace » | "a piece of ice" |
| şelal: fir, fir, sêrek | seyrek | clairsemé, espacé | sparse |
| şêrgul: bijîya şêr | aslan yelesi | crinière de lion | lion's mane |
| şetele: | 1. çığ, 2. bela, felaket, musibet | 1. avalanche, 2. calamité, désastre | 1. avalanche, 2. trouble, calamity, disaster |
| <şetele ket nav pêz> | | | |
| şewe, şeb | göztaşı | sulfate de cuivre | copper sulfate |
| şewşibandin | yalpalamak | tituber, chanceler | to lurch |
| şirne: qîl, limbûz, lembûz, limûz | fil veya vahşi domuz dişi | défense (de sanglier) | ivory, tusks |

Hin Peyv ji pirtûkên Xelîfe Êsiv

- 1 -

Amadekar: Omîdê Mistefayê CELALÎ

| kurdî | tirkî | fransîzî | îngilîzî |
|--|-------------------------|---|---------------------------------|
| Eqîda Îmanê | | | |
| tuneyî: çuneyî | adem, yok (yoktan) | néant | nothingness |
| xudanruh: giyandar | canlı varlık | vivant, être vivant | living being |
| destbilindkirin: destvegirtin, destraberkirin | dua için el açmak | le fait de lever les mains pour la prière | raising hands in prayers |
| adetî: ji rêzê, edetî | sıradan, bayağı, olağan | usuel, ordinaire | normal, ordinary |
| Xutbe | | | |
| dehyek: ji dehan yek | onda bir | un dixième | one tenth |
| Feraîz | | | |
| bêparî: zirbehîrî, zirbarî | mahrum bırakma / etme | privation | deprivation |
| xudanferz: xwedanê pareke mîratelyê: | mirasçı, kalıtçı | héritier | heir |
| mîratgir, mîratxwer, wêris | | | |
| navdan: binavkirin | adlandırmak | nommer | to name |
| Teqrîz | | | |
| kûtxwer: kurtêlxwer | yyici | vénal | venal |
| bêbiha: bêqîmet | değersiz | sans valeur, vil | worthless |
| xudanbiha: biqîmet | değerli | précieux, qui a de la valeur | worthy, valuable |
| kêmbiha | ucuz, değeri düşük | bon marché | cheap |
| palan: kurtan, semerê keran | semer | bât | packsaddle |
| pêç: şaşik | sarik | turban | turban |
| <ji serî veke pêç û emamet, xudê nedaye wî bext û seadet> | | | |
| bihîn= bihîstin <ger nebihin> ez dibihim, min bihî | duymak | entendre | to hear |
| nav mela: bi nav mela ye, qaşo mela | sözde molla | il n'a de mollah que le nom, soit disant mollah | so-called molla |
| bêçav: çavkor, kor, kore, nebîna | kör | aveugle | blind |
| payende: <dinya ne payende û baqî ye> | destek, dayanak | durable | enduring, eternal, long-lasting |
| can: ciwan <mizgîn li we be ey pîr û cana, çi kesê wê bixwîne dibe feqîh û zana> | genç | jeune | young |
| şorezar: şorekî, şorak, şoregeh | çorak arazi | terre infertile à cause de la salinisation | barren land |
| serece: cizama keran: | eşek cüzzamı | lèpre des ânes | leprosy of donkeys |
| <zen dikin li wan rabûye serce> | | "ils croyaient avoir contracté la lèpre des ânes" | |

Heşare

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

| kurdi | latînî | tirkî | fransîzî | îngilîzî |
|---|---|-----------------------------|-----------------------------------|---------------------------|
| heşare | <i>insectum</i> | haşere | insecte | insect |
| kurmê daran ê sor | <i>cossus cossus</i> | ağaç kızılkurdu | cossus, gâte-bois | larva of goat moth |
| kurmê daran ê zer | <i>zeuzera pyrina</i> | ağaç sarıkurdu | zeuzère du poirier | larva of leopard moth |
| spîyê gezoya bîstanan | <i>aphis gossypii</i> | pamuk yaprak biti | puçeron du cotonnier | cotton aphid |
| spîyê gezoya gulan | <i>aphis rosae</i> | gül yaprakbiti(gül afidi) | puçeron vert du rosier | rose aphid |
| spîyê pelên gûzan | <i>callaphis juglandis</i> | ceviz yaprak biti | puçeron du noyer | walnut aphid |
| spîyê pelên teneyî (dext) | <i>rhopalosiphum padi</i> | ekin yaprak bitleri | puçeron du noyer | the bird cherry-oat aphid |
| spîyê simbilên (guliyên) genimî | <i>sitobion avenae</i> | hububat yaprak biti | puçeron du noyer | the english grain aphid |
| spîyê pelên genimî | <i>schizaphis graminum</i> | buğday yaprak biti | puçeron de céréales | spring grain aphid |
| spîyê pelên xoxan | <i>myzus persicae</i> | şeftali yaprak biti | puçeron vert du pêcher | green peach aphid |
| spîyê koka nîskan | <i>smyntuodes betae</i> | mercimek kök biti | puçeron de la racine de lentilles | bean root aphid |
| kurmê baqilkan | <i>bruchus rufimanus</i> | bakla tohum böceği | charançon de pois | broad bean weevil |
| kurmê nîskan | <i>bruchus lentis bruchus ervi</i> | mercimek tohum böceği | zabre de graines de lentilles | lentil seed beetle |
| kurmê pelên genimî | <i>tinea granella</i> | buğday güvesi | teigne des grains | corn moth |
| kurmê koka teneyî (dext) | <i>zabrus tenebrioides</i> | ekin kamburböceği | zabre des céréales | corn ground beetle |
| spîyê genimî | <i>sitophilus granarius</i> | buğday biti | charançon du blé | wheat weevil |
| spîyê birincî | <i>sitophilus oryzae</i> | pirinç biti | charançon du riz | rice weevil |
| maşotê nokan | <i>heliathis dipsacea</i> | domates yeşilkurdu | leucanie | marbled clover |
| maşotê gûzika pembûyî | <i>helioverpa armigera</i> | pamuk yeşilkurdu | ver de coton | cotton bollworm |
| maşotê pelên pembûyî | <i>spodoptera littoralis</i> | pamuk yaprak kurdu | noctuelle méditerranéenne | egyptian cotton leafworm |
| maşotê pembûyî | <i>spodoptera exigua</i> | çizgili yaprak kurdu | légionnaire de la betterave | beet armyworm |
| kurmê gindoran (petêx) | <i>myiopardalis pardalina</i> | kavun sineği | mouche de melon | melon fly |
| kurmê fistiğan | <i>eurytoma pistacia</i> | fıstık içkurdu | | eurytoma |
| qoşnîla koka nîskan | <i>porphyrophora polonica</i> | mercimek kökkoşnili | chenille de lentilles | polish cochineal |
| kurmê şitlê sebzeyan | <i>agrotis segetum</i> | bozkurt | noctuelle des moissons | turnip moth |
| tevnepîrka pembûyî | <i>tetranychus urticae</i> | iki noktali kırmızı örümcek | tétranyque à deux points, | twospotted spider mite. |
| tevnepîrka pembûyî ya sor | <i>tetranychus cinnabarinus</i> | kırmızı örümcek | araignée rouge du cotonnier | the carmine spider mite, |
| kurmê gûşiyên tiriyan | <i>lobesia botrana</i> | salkım güvesi | eudémis de la vigne | european grapevine moth |
| maşotê çereyê | <i>pyrausta sticticalis</i> | çayır turtılı | chenille des près | meadow caterpillar?? |
| qimilê tûyan | <i>dolycoris baccarum</i> | đut kimilî | punaise des baies | sloe bug |
| kuliyê kesk | <i>tettigonia (locusta) viridissima</i> | yeşil çekirgeler | grande sauterelle verte | great green bush-cricket |
| kuliyê çolê | <i>schistocerca gregaria</i> | çöl çekirgesi | criquet pèlerin | desert locust |
| gûstêrk, teyîsteyîsok, teysok, stêrstêrok, agirstênk, zîqzîqok, baranbirk | <i>lampyris noctiluca</i> | ateş böceği | lampyre, ver luisant | glow-worm |
| spîyê guritîyê | <i>sarcoptes scabiei</i> | uyuzböceği | sarcopte | itch mite |



Kurmê daran ê sor -
Cossus cossus



Kurmê daran ê zer -
Zeuzera pyrina



Spîyê gezoya bîstanan -
Aphis gossypii



Spîyê gezoya gulan -
Aphis rosae



Spîyê pelên gûzan -
Callaphis juglandis



Spîyê pelên teneyî (danî) -
Rhopalosiphum padi



Spîyê simbilên (guliyên) genimî -
Sitobion avenae



Spîyê pelên genimî -
Schizaphis graminum



Spîyê pelên xoxan -
Myzus persicae




Spîyê koka nîskan -
Smyntuodes betae



Kurmê baqilkan -
Bruchus rufimanus



Kurmê nîskan -
Bruchus lentis



Kurmê pelên genimî -
Tinea granella



Kurmê koka teneyî (dext) -
Zabrus tenebrioides



Spîyê genimî -
Sitophilus granarius



Spîyê birincî -
Sitophilus oryzae



Maşotê nokan -
Heliothis dipsacea



Maşotê gûzika pembûyî -
Helicoverpa armigera



Tevnepîrka pembûyî -
Tetranychus urticae



Tevnepîrka pembûyî ya sor -
Tetranychus cinnabarinus



Kurmê gûşiyên tiryan -
Lobesia botrana



Maşotê çereyê -
Pyrausta sticticalis



Qimilê tûyan -
Dolycoris baccarum




Kuliyê kesk -
Tettigonia (Locusta) viridissima



Kuliyê çolê -
Schistocerca gregaria



Gûstêrk -
Lampyrus noctiluca



Spîyê gurîtiyê -
Sarcoptes scabiei

Hinek termên entomolojîyê

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

| kurdî | latînî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|----------------------|---------------------|--------------------|-----------------------|
| şehmar, şemar, bijmar, şarmar, zîvzîve, hezarpê, çîlpê, pîrpêtk | <i>chilopoda</i> | çîyanlar | mille-pattes | milipede, centipede |
| kurmê toxuman | <i>bruchidae</i> | baklagiller biti | puceron des cosses | bean weevils |
| spîyê biqalîk | <i>diaspididae</i> | kabuklu bitler | hémiptères | diaspididae, hemitera |
| goştîxwer | <i>carnivora</i> | etçîl | carnivore | carnivora |
| perwanegel | <i>lepidoptera</i> | kelebekker | lépidoptère | lepidoptera |
| mêşgel | <i>diptera</i> | çiftkanatlılar | diptère | diptera, fly |
| gûzika buhukan | <i>cocoon, pupa</i> | böcek mummyaları | cocon | cocoon, pupa |
| xerzê mêşan | | sinek yumurtaları | œuf de moustique | mosquito eggs |
| kurmê daran | <i>cossidae</i> | ağaç güvesi | zeuzère | cossidae |
| spîyê pelên nebatan | <i>aphididae</i> | yaprak biti | aphydés | aphididae |
| neçîrvan | <i>predator</i> | avcı | prédateur | predator |
| heşerexwer | <i>insectivorous</i> | böceklerle beslenen | insectivore | insectivore |
| giyaxwer | <i>herbivor</i> | otçul | herbivore | herbivore |

Gulûgîyayên Kurdistanê

- I -

Amadekar: Ehmedê DIRÎHÎ

Termînolojîya zanistî ya botanîk û gulûgîyayan xwedî zimanekî pir taybetî ye. Di vê zanistê de her gulûgîyayek xwedî çend navên lipeyhev in. Bo nimûne, wek navê malbatê, navê wan yên xweser, navên varyetê û paşnavê wan.

Gava ku gulûgîyayeke nû yan jî cureyeke wê ya nû têtê dîtin, eger berê navê vî cureyî tune be, navê wê yê zanistî li gor prensîpeke zanistî û navneteweyî lê têtê kirin. Navê bingeîn dîyar e, lê paşnav û cure ne dîyar e. Zanyar di vê rewşê de çend rêyan didin ber xwe. Yek ew e ku navê kesê ew gulûgîya dîtîye lê bête zêde kirin. Ya din jî, ku piranî li gor vî dîçin, navê cihê ku ew lê hatîye dîtin lê, zêde dikin. Ew cih dikare devereke be, bajar yan jî welatek be, yan jî navê xelkekî be. Bi vî rengî ew dibe xwedî navekî nû yê zanistî û temam. Êdî ew nav li gor wê li navenda navneteweyî ya qeydkirina navên zanistî têtê nivîsin û dikeve listeya katalogan.

Di navên gulûgîyayan de, em dibînin ku gelek navên zanistî hene, ku di bin van navên latîni de hatine nivîsîn: "Kurdicum, Kurdica, Kurdistanica, Carduchorum/ Karduchorum".

Me wisan rast dît ku em wan navaan wergerînin kurdî û bikin: Kurdî/... Kurdan, Kurdistanî/ ... Kurdistanê, Kardoxî.

Bo nimûne, "Tulipa" heye ku bi kurdî jê re dibêjin -alal, hilale, mêlaq, lale, helal. Lê li Kurdistanê cureyek hatîye dîtin ku jê re gotine "Tulipa Kurdica". Em jî vî navî dikin -laleya kurdî-. Heçî peyva lale ye, peyveke kevn ya îranî ye; -alaleg- paşê di farsî û kurdî de bûye -lale/ alal hwd.

Li gor vî, em li jêrê hindêk ji wan wergeran pêşkêş dikin.

Beşa *Kurdicum* û *Kurdica*

| latîni | kurdî |
|--|------------------|
| <i>Achillea nobilis subsp kurdica</i> | Bêwîjan kurdî |
| <i>Alcea kurdica</i> | Hêroya kurdî |
| <i>Anchusa azurea var kurdica</i> | Gûriza kurdî |
| <i>Anthemis kurdica</i> | Beybûna kurdî |
| <i>Euphorbia kurdica</i> | Xweşîla kurdî |
| <i>Fritillaria crassifolia subsp kurdica</i> | Gulşilêra kurdî |
| <i>Fritillaria imperialis subsp kurdica</i> | Gulnixwîna kurdî |
| <i>Hesperis persica subsp kurdica</i> | Qaçmûka kurdî |
| <i>Linum pycnophyllum subsp kurdicum</i> | Kitana kurdî |
| <i>Nerium oleander subsp kurdicum</i> | Rûlika kurdî |

| latîni | kurdî |
|---|---------------------------|
| <i>Ornithogalum kurdicum</i> | Axbandira kurdî |
| <i>Orobancha kurdica</i> | Giyagurga kurdî |
| <i>Phlomis kurdica</i> | Sîvanoka /guhbeloka kurdî |
| <i>Pistacia atlantica subsp kurdica</i> | Kizwana kurdî |
| <i>Plantago kurdica</i> | Belghewêza kurdî |
| <i>Prunus kurdica</i> | Êrûga kurdî |
| <i>Ranunculus kurdicus</i> | Çûnga kurdî |
| <i>Thlaspi kurdicum</i> | Nançûka kurdî |
| <i>Tragopogon kurdicus</i> | Spinga kurdî |
| <i>Tulipa kurdica</i> | Laleya / alala kurdî |



Achillea nobilis subsp kurdica
Bêwîjana kurdî



Alcea kurdica
Hêroya kurdî



Anchusa azurea var kurdica
Gûriza kurdî



Anthemis kurdica
Beybûna kurdî



Euphorbia kurdica
Xweşîla kurdî



Fritillaria crassifolia subsp kurdica
Gulşilêra kurdî



Fritillaria imperialis subsp kurdica
Gulnixwîna kurdî



Hesperis persica subsp kurdica
Qaçmûka kurdî



Linum pycnophyllum subsp kurdicum
Kitana kurdî



Nerium oleander subsp kurdicum
Rûlika kurdî



Ornithogalum kurdicum
Axbandira kurdî



Orobancha kurdica
Giyagurga kurdî



Phlomis kurdica
Sîvanoka - guhbeloka kurdî



Pistacia atlantica subsp kurdica
Kizwana kurdî



Plantago kurdica
Belghewêza kurdî




Prunus kurdica
Êrûga kurdî



Ranunculus kurdicus
Çûnga kurdî



Thlaspi kurdicum
Nançûka kurdî



Tragopogon kurdicus
Spinga kurdî



Tulipa kurdica
Laleya - alala kurdî

KURMANCE

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN

Kamuran A. BEDIR KHAN

Joséfa BERTOLINO

Kendal NEZAN

Ferhenga KURDÎ - FRANSIZÎ

PÊŞGOTIN

Ferhenga kurdî-fransizî xwedî dîrokeke dûr û dirêj a ku diçe ta salên 1930an. Di wê demê de, birayên Bedirxan, tevî hin rewşenbîrên kurd ên li Binê Xetê, dest bi tevgera nûjeniya kurmanciyê kiribûn, kovara Hawarê û pirtûkên bi alfabe ya xwe ya latîni çap dikirin. Mîr Celadet li ser rêzimana kurmanci û ferhengeke kurdî-kurdî dixebitî. Mîr Kamûran jî dixwest ferhengeke kurdî-fransizî ya berfireh amade bike.

Rêzimana Mîr Celadet, piştî mirina wî ya bêwext, bi destê hevalê wî Roger Lescot hat temam kirin û di sala 1970ê de, li Parisê, li jêr navê *Grammaire kurde (dialecte kurmandji)* çap bû. Mixabin, temenê Mîr Celadet wefa nekir ku xebata ferhenga xwe ya kurdî-kurdî bibe serî.

Mîr Kamûran di sala 1947an de li Fransayê bicih bû, û ta 1970ê li Xwendegêha zimanên rojhilatî (*Ecole des langues Orientales*) ya Zanîngeha Parisê profesoriya ziman û çanda kurdî kir. Mîr, di van salan de çend pirtûk li ser rêzimana kurdî û fêrbûna zimanê kurdî weşandin, Qur'an wergerand kurmanci û li ser ferhenga kurdî-fransizî xebitî. Hevjîna wî, Nathalie d'Osovetzky, ku aristokrateka polonî bû û baş bi rûsî û almanî jî dizanibû ta mirina xwe, di sala 1975an de, alîkariya vê xebatê kir, nexasim ji bo ferheng û çavkaniyên rûsî.

Di sala 1978an de Mîr Kamûran jî piştî nexweşîneke kurt koça dawî kir. Berî wefata xwe ji bo ferhengê bi qasî 25.000 peyv berhev kiribûn û wergerandibûn fransizî. Lê ew di wê baweriyê de bû ku ew xebatê nivêcî bû, ji çapê re ne amade bû. Dixwest ku bi hindikî peyvên ku di ferhengên Qanatê Kurdo û Bakaev de hene li ser bîna zêde kirin û ferheng bi peyvên soranî û dimilî jî bîna dewlemend kirin ta ku bibe ferhengeke hemî zarava û devokên kurdî.

Ev erka giran bi awayekî kete ser milên min.

Amadekirina ferhenga zimanê gelekî ku di coxrafyayê berfireh, asê û perçekirî de belav bûye, nebûye zimanê dewletê, neketiye nav teşeyên kedi yê normên fermî, bê guman ne karê kesekî û ne jî yê çend salan e. Ji bilî bikaranîna berhevok û ferheng û çavkaniyên nivîskî, xebatên li ser zargotinê, li ser zarava û devokên Kurdistanê û yê civatên kurdî yê dervayî Kurdistanê (Xorasan, Anatolya navîn, Qefqas û hwd.) divêtin.

Ji bo destpêkê me komeke xebatê li Parisê pêk anî. Tê de: du xwendekarên berê yê Mîr Kamûran, Joséfa Bertolino û Caroline Delassus, hevjîna Roger Lescot, Marlise Lescot, zimannasê kurd Xosrow Ebdullahi û hin welatîyên kurd ên ku li gundan mane, cotkarî, şivanî an jî pişekarî kirine, bi kurdî mezîn bûne û jiyane.

Piştî danîna Enstîtuya kurdî, bergeha me firehtir bû; me dikarî salê du caran zimannas, nivîskar û rojnamevanên kurd ên ji navçeyên cihê yê Kurdistanê bicivînin, li ser pirsên berhevkirina peyvên kurdî yê devokan, yê pişeyan, yê klasîkên

nivîskî û yê zargotiniyê û bikaranînan wan ên îdyomî û methelokî bixebitin. Xebatên *Kurmanci*, li jêr serpereştiya Reşo Zilan, alîkariyê hêja dan zelalkirina wateyên gelek peyv û îdyoman û bi vî awayî ferhenga me dewlemendtir kirin. Dîsa, xebata koma *Vate* li ser zaravayê kirdkî, li jêr serpereştiya Malmîsanij, û ferhenga wî, bûn bingehên peyvên dimilkî yê ferhenga kurdî-fransizî.

Di warê soranî ango kurdî ya navendî de me ferhengên kurdî-îngilîzî yê Tewfîq Wehbi û Şefîq Qezaz wekî bingeh zanî, ji wan û ji ferhengên kurdî yê pirzaravayî yê Gîwî Mukriyanî û Hejar Mukriyanî gelek sûd wergirt.

Ji dawiya sedsala XIXan ve de rojhilatnasên rûs û zanayên kurd ên sovyetî û rûsî di gelek waran de xizmeteke mezin dane pêşvebirina kurdnasiyê. Me di xebata xwe de ji Ferhenga kurdî-fransizî (*Dictionnaire kurde-français*) ya Alexandre Jaba, ku di sala 1879an de li Sankt Petersburgê çap bûye û ji 15.000 peyvyan pêk tê, ji ferhengên kurdî-rûsî yê zanayê kurd ê navdar Qanatê Kurdo, ji ferhengên X. Bakaev û I. Farîzov gelek sûd wergirtiye her weha ji berhevokên hêja yê zargotina kurdî yê zanayên kurd Ordixan û Celîl Celîl.

Li Bakurê Kurdistanê jî di niv-sedsala dawîn de ferhengnasiya kurdî pêşve diçe. Piştî ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa bi wergera tirkî ya M. Emîn Bozarlan, ferhengên kurdî-tirkî yê Musa Anter (1967) û D. Îzolî (1992), Zana Farqînî ferhengên mezin ên tirkî-kurdî (2000) û kurdî-tirkî (2005) amade û çap kirine ku xebatên dewlemend û hêja ne.

Ferhenga kurdî-fransizî ya li destê we yekem ferhenga bi zimanekî biyanî ye ku peyvên ji hemû zarava û devokên kurdî bi wergera wan a fransizî pêşkêşî xwendevanan dike. Tê de bêtir ji 85.000 peyv hatine civandin. Lê ji ber ku hin peyv li gor navçe û devokan bi awayên cuda tîna bilêv kirin û lewre hatine dubare kirin hejmara peyvyan bi qasî 70.000î ye. Me ev guherteyên devokî bi hêviya ku rojekê bi kêrî lêkolînê li ser *diyalektoloji* ango zaravanasiya kurdî bîna xistin nav ferhengê.

Li gor zimanên din ev hejmareke gelek bilind û nişana dewlemendiyeke mezin e.

Kurdî, nexasim di warê jiyana gundîtiyê, ya cotkarî û xwedîkirina pez û dewaran de, her wisa jî di warê peyvendiyan civakî û merivatiyê de pirr zengîn e.

Em carina di warê wergera wan a fransizî de ketin tengasiyê. Zimanê Molière û Voltaire her çend kevn û navdar be jî, ji bo **xezûr** û **zîrbav** tenê peyva *beau-père*, ji bo **xesî** û **jinbavê** peyva *belle-mère*, ji bo **zava** û **kurhilî** *beau-frère*, ji bo **pismam**, **kurxal**, **kurmet**, **kurxaltî**, **amoza** peyva *cousin*, ji bo **dotmam**, **keçxal**, **keçmet**, **keçxaltî** peyva *cousine* bi kar tîne.

Di kurdî de bi dehan peyv li ser teşeyên simbêlan, li ser awayên serî, poz û difn, hwd hene ku li hemberî wan kêr wêşeyên fransizî hene, her weha ji bo navên kar û berxan li gor jî û temenên wan.

Di milê din de, kurdî di warên ramaniyê, felsefî, zanistî û îdarî de beşeke girîng a peyvên xwe ji zimanên din, bi taybetî ji erebî û fransizî deyn kiriye. Tê de çend sed peyvên yewnanî (bexdenûs, fidan, fistan, îspanax, kilîse, mengene, mermer, qanûn, qelem, hwd.) hene, lê yê tirkî pirr kêr in. Ta ku me kariye, me li ber peyvên ku ji zimanên biyanî ketine nav kurdî rişeya wan diyar kiriye.

Lê hin peyvên reng e biyanî ketine kirasekî kurdî yê wisa lihevhatî ku reg û rêçikên rêwîtiya wan a dîrokî ji binemala wan a seretayî êdî nexuya ne, li benda lêkolînê etimolojiyê zanistî ne.

Piraniya peyvên kurdî *polisemîk* ango pirwate ne. Wateya wan di nav zeman de, carna jî li gor herêm û navçeyan, li gor civatê û awayê bikaranîna diguhere. Tenê di mînakên de bikaranîna wan dikare têgihîştina wan zelal û ronak bike. Lewre me di vê ferhengê de cihê fireh daye mînakên bikaranîna peyvyan di wateyên wan ên cuda de. Ev nimûne, li gor pêdiviyê, ji çavkaniyên zargotinê, ji gotinên pêşyan û ji kilam û stranên hatine hilbijartin.

Wekî îngilîzî, kurdî jî pirîcar merem û mebestên xwe, ziravî û nuansên xwe bi formên îdyomî îfade dike. Û me qasî pê zaniye ew îdyom berhev kirine û bi kar anîne.

Ferhengên bêkêmasî, yê ku tevahiya peyv û dewlemendiyan zimanekî bicivînin nîn in. Ferhenga me jî ne îstisna ye; wekî Xanî yê mezin gotiye ji "kemalê dîr e". Peyvên hin devokan, yê ku em ji wateya wan ne ewle bûn, yê nûçekirî û hêj baş rûneniştî, navên hin giya û çûkan ji ber nebûna agahiyên tekûz di vê çapa yekem a ferhengê de cih negirtin Em hêvîdar in ku xwendevan û zimannas me ji van kêmasî û şaşyan agahdar bikin ku çapên pêşerojê kamiltir bin.

Ferheng berhema xebata gelek welatîyên kurd û dostên fransiz e. Navên hin ji wan beşdarên domdar ên xebata amadekirinê, ya xwendin û rastkirinê, di rûpela pêşî ya taybetî de hatine nivîsin. Em ji hemîyan re ji bo keda wan, her weha ji ferhengnasê fransiz ê navdar Alain Rey ji bo pêşgotina wî, ji *Centre national du livre* (Navenda neteweyî ya pirtûkan) ya Fransayê jî ber arîkariya wê ya ji bo çapa ferhengê spasdar in.

Spasiyê germ û taybetî ji bo dotmîra me ya wefadar Sinemxan Bedirxan ji bo hevkarî û pistivaniya wê.

Bi vê xebatê me xwast rêza xwe ji zimannas û welaparêzê kurd ê mezin Mîr Kamûran Bedirxan re nişan bidin, amanca ku di vî warî de dabû ber xwe bibin serî û giyanê wî yê pak şad bikin.

Em hêvîdar in ku ew ferhenga ku tabloyê berfireh a zimanê kurdî yê zindî, geleri û edebî tevî dewlemendiyan wî yê zaravayî û devokî pêşkêş dike alîkar be ji bo xwendevanên kurd û fransizîxêv ên din ji bo çêtir têgihîştina ziman û çanda kurdî.

Kendal Nezan

www.arsivakurdi.org
www.arsivakurdi.org

INSTITUT KURDE DE PARIS

Gulana 2017an de
derdikeve

DICTIONNAIRE
KURDE - FRANÇAIS

FERHENGA
KURDÎ - FRANSIZÎ

Sous la direction
de Kendal NEZAN

Préface
d'Alain REY

85 000
entrées

*R*iveneuve
éditions